Journalists against the borders

# Çîroka xwe ji me re bêje

¿Tu penaberî yan jî tu neçar mabû ji welêt derkevî? ¿Tu dixwazî hevkariya me bikî ji bo çîroka te bê naskirin?

Ji me re binivisîne, emê bihêlin ku çîroka te ji hêla kesên din ve, ji welatên din li Ewropa û Amêrîkayê, bê xwendin. Ev tişt girîng e, ji ber li welatên din tiştê ku li rastiyê çêcibe nas nakin, ew nizanin ku hûn kesên ku dixwazin jiyaneke normal bijîn.

Em grûpek in ji kesên xwebexş ku çîrokên rasteqîn kom dikin û dixwazin li welatên din yên Ewropa û Amêrîka bidin nasîn, ji bo ku bizanibin çi di rastiyê de çêdibe û bikaribin derdê we nas bikin, ji bo ku ramanên xwe derbarê we û biguherînin û ew siyasetên ku sînor ji ber tirsê digrin jî biguherînin.

Tu dikarî çîrokên kesên din di vê malperê de bixwînî:
www.journalistsagainsttheborders.com

Çîroka xwe binivsîne û bişîne vê navnîşanê: E-mail:
info@journalistsagainsttheborders.com, an jî bi rêya
WhatsApp +30 6931399200

Bi zimanê xwe çîrokê binivisîne, emê wê wergerînin û di medyayê de (Rojname, kovar, ...) yên welatên din an jî li malpera xwe çap bikin.

Eger tu dixwazî navê te wek xwediyê çîrokê bê xuyan baş e, lê eger tu naxwazî bê xuyan ji ber tirsa ku malbat te li welatê te rastî tengasiyê werê, vêca navekî din bide me, xem nake. Eger telefon an jî komputera te nîn e, li ser kaxesê binivisîne, piştre li hevaekî bigere ku înternet di telefona wî de hebe û ji me re wêneyek bi rêya WhatsApp an jî emailê bişîne. Eger problem nîne tu dikarî wêneya xwe ligel çîrokê jî bişînî ji bo em wê çap bikin, eger tu naxwazî wêne bê weşandin, xem nîne.

Gelek spas
Ekîpa Rojnamevanên Dijî Sînoran